

Dr.Nûredîn Zaza
1919 - 1988

# NEWROZ

Xebat ji bo :
* Zordarî ji ser gelê me yê Kurd li Sûriyê rabe.
* Azadiya demokrat û rêzgirtina mafên mirovan.
* Mafên gelê Kurd ên netewî di çarçewa yekîtiya welêt de.



Osman Sebrî
1905 - 1993

*Ji weşanên* Partiya Yekîtî ya Demokrat a Kurd li Sûriyê

*Hejmar (116 -117)* *Sal 20* *Mijdar û Berfenbar* *2015z - 2627k* *Buha (50)L.S*


# Hebûna Rûsî li Sûryê xwedî dîrok û bingeh e

## Hevpeyvîneke bi Mihidîn Şêx Alî re

**Desteya sernivîser**

Li dawiya meha yazdehê, rojnamevana malpera Kurdstrîtê, Roj Osî hevpeyvîneke nivîskî bi berêz sekretêrê Partiya Yekîtî ya Demokrat a Kurd li Sûryê(PYDKS) Mihidîn Şêx Alî re kir û di malperê belav kir. Ji ber girîngiya xal û nêrînên ku tê de hatine, û piştî rêdanê ji Berêz Şêx em beşina ji axaftinê di rojnama Newrozê de belav bikin.

Li ser pêwendiyên PYDKSê bi Encûmena Niştimanî ya Kurdî re li Sûryê(ENKS) mamoste Ş.Alî wiha dibêje: Ji nêzîkê salekê de, aliyên destbilind di ENKSê de bi biryareke bi lezûbez, partiya me û partîne din ji ENKSê û komît û nûnertiya wê li hundir û derveyî welêt hatin dûrxistin. Ew biryara li gor boçûnên hinek aliyên di Iitîlafa Sûrî ya rikber ku Tirkiye ji xwe re kirine wek hembêzeke germ de hate standin, û wek revekê bû jî ji pêkanîna lihevkirina Dihokê ku rola partiya me di amadekirina wê û berevaniya ji ber ve balkêş bû. Loma jî PYDKSê di ber siyaset û reftarên ENKSê de ne berpisyar e. Lê belê PYDKS wê berevaniyê ji ber doza gel ve li hundir bike, ……2




## Civata salane ya Saziya Fêrkirin û Parastina Zimanê Kurdî li Sûriyê (Parêzgeha Hesekê )

Roja Înê 25ê meha Berçile 2627 K/2015 Z û li salona Seyran li bajarê Qamişlo, Saziya Fêrkirin û Parastina Zimanê Kuerdî li Sûriyê (Parêzgeha Hesekê), bi amadebûna saziyên civaka sivîl û hin partiyên tevgera Kurdî li Sûriyê, civata xwe ya salane lidarxist. ................7

## Parêzer Mihemed Nûrî Arif Temenê Xwe Dît

Li roja nehê meha Berfenbarê(K1) sala 2015an, parêzerê navdar mamoste Mihemed Nûrî Arif konê xwe pêça û ji nav me bar kir. Mamoste Mihemed nûrî li sala 1918an li gundê Bircê- navça Efrînê ji dayîk bû û li goristana gundê xwe jî hat veşartin. …………8

## Hebûna Rûsî … Dûmahîk

guhertinên li ser zemînê û nûbûyeran jî bişopîne û bi erka xwe a dîrokî rabe. Di vî warî de desteya rêvebir ya partiya me pirojeya nêrîneкê li derbara rewşa sûrî ya giştî û kurdî ya taybet pêşniyar kir, belge bi rengekî fere hate belavkirin û li ber roniya wê jî kar dibe.

Li derbara xwestina rêdanê ji ``rêvebiriya xweser``, rêzdar Ş.Alî got: Li ser bingeha danûstandina erênî bi saziyên rêvebirya xewser re li navçeyên kurdî li Bakurê Sûryê û pêwîstiya parastina wê, û pergal-kirina têgeha hebûna zagoneke bikêmanî, hezar carî ji tunebûna wê çêtir e, partiya me belgeyên ku ger-ek bûn pêşkêş kirin, û mercên ku di zagona partiyan a ku ji aliyê saziyên rêvebiryê derhati bûn pêk anîn. Û bi wê yekê, rêdana zagonî ji bo karê partî û navendên wê li Efrîn, Kobanê û Cezîrê hat birin.

Û ji bona rista[rola] PYDKSê di Girseya Partiyên Lêvegera Siyasî de, berêz Ş.Alî got, ku hevkariya di karên meydanî de li hundirê Sûriyê li ba PYDKSê biryareke bingehîn e, nemaze jî eger hevkarî li gor piro-jeya siyasî ya asta nizimtirîn û şêweyên kar ên naskirî be. Di vê rêveçûnê de, civîn û hevdîtinên li ser hev di mehên derbasbûyî di navbera pênc partiyan de çêbûn, ew partrî bi ``Girseya Partiyên Lêvege-ra Kurdî hatin naskirin, di nav wan de PYDKSê jî heye. Gelek kar û çalakî li dar ketin, û li vê dawiyê komîteyên hevbeş li hemî dever û navçeyên parêzgeha Hesekê-Cizîrê, li navçeyên din û li derve jî hatin avakirin. Li vê dawiyê belgepiro-jeya bernameyeke siyasî ji Girseyêr re hate danîn, kar dibe ku belgeyek ji bo lisazxistina kar û çalakiyên wê were kutakirin, daku ew li ser hemû partî û çalaksaziyên din vekirî be, armanc ew e, ku rûbera karûbarê wê fere bibe ta ku sîwaneke siyasî ya civakwerî ava bibe, û bibe navnîşaneke şaristanî ji bo yekrêzî û jihevtêgihîştinê re.

Di warê danûstandina bi partiyên din re, rêzdar Mihidîn Şêx Alî xuya kir, ku danûstandina wan bi aliyên din re, çi kes û çi kom, li ser bingeha biserxistina têgihîştinên serke li ser ên nesereke radibe. Bingeh jî berjwendiya giştî ye. Û ewên ku bi mebest nav û dirûşma partiya El Wehdê bi ser xwe de dikin, daku -bi têvedana hinekên din- ristekê bilîzin û pergala partiyê ya rêxistinî lawaz bikin, û hebûna wî ya dîrokî û siyaseta wî ya ku mi-jarên bingehîn dide pêşiya ên nebingehîn, û li dijî karê silogan-vaniyê jî radiweste, baweriya wan kesan bi rastî û dadmendiya doza Kurd li Sûryê û taybetiyên wê tune ye, loma hîç guhdana me jî bi yên wilo tune ye.

Rêzdar Ş.Alî berdewam kir û got, ku tiştên li navçeyên kurdî li Bakur Sûryê dibin, beşek in ji tiştên wêranbar ku li seranserî Sûryê dibe ne, lê netê wê wateyê ku cudahî û rewşine têvel di navbera wan de hebin. Wek mînak ew cudatiyên ku di navbera du parêzgehên Sûrî mîna Siwêdê û Reqayê de hene. Lê navnîşana mezin li navçeyên kurdî hebûna saziyên ``rêvebiryeke xwe-ser`` û bi pergaleke kurdî ye, ewa ku li ser hemî pêkhateyên din, ji Ereb, Siryan, Kildo Aşor, Tirkman, Çerkez û Ermenan re dilvekirî ye, û pozbilindiyên olî, bineolî yan jî netewî û nijadperestî li tu aliyan nake. Û hêzeke wê ye parastinî jî heye û xwedî kesayetiyeke taybet e, û li seranserî Sûryê, herêmê û cîhanê bi navê Yekîneyên Parastina Gel û Jinan YPG-YPJ naskirî ye. Hêzên wê yên asayişê û polîsên hatûçûyê jî hene..û h.w.d.

Têrora DAIŞ, Nusrayê û yên di çerxa wan de digerin, hîn jî tevaya navça Efrînê û deverên Rojavayê Kobanê li ber kenara Çemê Ferêt dide ber xwe. Ji bilî dorpêçkirin û revandina sîvîlan ji hêla wan koman ve, alîkariyên mirovî û hawarçûnî - yên pir hindik li hembera navçeyên sûrî yên din- ku digihên navçeyên kurdî, ew jî li gor dilxwaziya aliyên berpirsiyar ên cîrana me ya bakurê ``Tirkiye`` tê kirin.

Li derbara destêwerdana Rûsan a yekser di rewşa Sûryê de, mamoste Şêx Alî got: Hebûna Rûsî li Sûryê xwedî dîrok û bingeh e. Civaka sûrî bi hemû pêkhateyên xwe ve- ji bilî hinek zêdegotinên sêwî yên hin ali-yên îslama siyasî û şivîleyên wê yên ``selefî-cîhadî``- tu rojan dijmantiyeke Rûsan ne dîtine. Azirbûna qeyrana Sûryê û zêdebûna rist û destêwerdana Tirkiyê di kitkitên pirsgirêka sûrî de, bi dandi-na peran a dewletên kendavê, ew ji bo guhertina hevsengiyê bi aliyê îslama selefî ya cihadî tê kirin. Wê jî kir ku dilê Mosko berhev bide û tirsên wê zêde bike. Loma rêvebiri-ya Kirêmlên yekser biryar da û bi riya hêza xwe ya ezmanî têkeve nava şer. Lê ew destêwerdana ne ji bo hezkirina ji sazûmana Be`is e, yan jî bersivdaneke erênî bû ji dax-waza wî re, bêtirî wê, ew berevanî bû ji ber hebûna Rûsya li perava Rojhilata Derya Sipî. Û ji bo ku, wek Rûs xuya dikin, hêzbûn û belavbûna DAIŞê û baskên Qa`îdê rawestîne. Ew rêxistinên ku di nava civakên li derdorên Rûsya de bi rû ye, û nêzîk ewleya wê jî dibe. Lê bi destêwerdana Rûsan û berî wê jî, tevgereke diplometîk ye çalak hebû, di encamê de têgihîştinên karane[عملي] bi Wîlayetên Emerîka yên Yekbûyî û hêzine herêmkî û kardêr[فاعلة] re hatin ristin.

*Wergerandin ji Erebî*: **Rozad Elî.**

# Beramberinek di Navbera Kongira Riyad Û Dêrikê De





**Memê Alan**

Kirîza sûriyê nêzî pênc salan di ser re derbas dibe. Yanê pênc sal ji wêrankirin û tarûmarkirinê û hîn jî asoya çareseriyê ne xuya ye. Ji ber ku çareserî ji destê xelkê sûriyê derketiye û ketiye destên hêzên herêmî û navdewletî. Û ta niha jî lihevkirin di navbera berjewendî û armancên wan ên dûr û dirêj de peyda nebûye.

Ta niha gelek hevdîtin û kongire ji bo çareseriyê li vir û li wir li dar dikevin. Hevdîtinên çêdibin û kongireyên li dar dikevin, hemî pêngavine rêdûzkirinê ne li ser riya çareserkirineke gîştî. Lê her kongirek ji van, û yên ku wê di rojên pêş de dê werin lidarxistin jî, bi nêrîn, dîtin û armancên cuda tên lidarxistin. Yanê erênî û neyêniyên xwe hene. Ew erênî û neyînî jî guhêzok in. Erênî û neyîniya wan kongiran li gor pêkanîna berjewendiyên pêkhateyên Sûriyê ne yek in. Belkî encamên ku ji kongireyekê dertên, ji pêkhateya Ereb re erênî bin û ji kurdan re neyênî bin; ji hin bineol û kêmnetewan re neyênî bin û ji hinên din re erênî bin. Ev newekheviya berjewendiyên pêkhateyên hundirê sûriyê, dewletên herêmê û yên navnetewî jî dihêlin ku careseriya giştî dûr bikeve, kongir pir bibin û kirîz jî berdewam û aloztir bibe. Çimkî xelekên berjewendiyan ketine nav hev û ser hev jî.

Emê li vir, her du kongirên Riyad û Dêrikê, ku li vê dawiyê li dar ketine bidin ber hev û bi hev re beramber bikin û bipîvin:

***Kongireya Riyadê** li 10-11/12/2015an de li dar ket. Ew ji encama kongireya Viyêna ya navdewletî bû. zlidarxistina wê bi Siûdiya Erebistanê hatibû hilpesartin, da ku rikberiya sûriyê wîne ser hev û ji bo çareseriya kirîza sûriyê bigihîne yek helwest û yek gotarê. Kongira Riyad ji van pêkhateyan pêk hat, Hemahenga Nîştimanî ya Sûrî, Komosyona Hevrêzî, hin kesayetên serbixwe û gelek hêzine çekdar mîna Ehrar Elşam El Îslamiye, Artêşa El-Îslam, hin hêzên bi navê Artêşa Azad..... û H.W.D. Mirov dikare bêje, ku piraniya beşdaran nûnerên îslama siyasî û olperest bûn. Di nava beşdaran de du kes ji E.N.K.S. di nava şanda Hemahengê, ligel kesekî Kurd di şanda komosyan hevrêz de û kurdekî serbixwe jî beşdar bûn.

Kongira Riyadê, Sûriya pêşerojê weha dixwaze: Sûriyeke Erebî Îslamî û mafên hemî pêkhateyên wê yên din jî, weke mafên hemwelatî werin parastin. Gerek e çareseriya kirîza sûriyê bê Beşar El Esed jî pêk were. Di gongirê de tu çareserî ji doz û pirsa miletê Kurd re wek pêkhateyeke sereke, ne ji dûr û ne nêzîk çêrê nebûye. Û ji ber ku Kongira Riyad bi piştgiriya pir dewletan hat lidarxistin, loma jî ew firkeke mezin bû di riya çareserkirina kirîza sûriyê de. Her weha ew ji bo gelê Kurd û pirsa wî li sûriyê û mûkurhatina li mafên wî jî pir metirsîdar e. Nemaze hilma şofenîzim û îslama siyasî jê hildikele. Jixwe, rola dewletên mîna Turkiyê tê de diyar bû.

*Kongira Dêrikê li sûriyê li bajarê Dêrika Cezîrê di 9/12/2015an de li dar ket. Piraniya beşdarên wê hêzên demokrat ên sûrî yên Kurd û xelkê Cezîrê bûn. Ew ji van çarçew û hêzên siyasî pêk hat: Partiyên Rêvebiriya Xweser, Girseya Partiyên Lêvegera Siyasî ya kurdî, şepola Qemih, Hevbendiya Niştimanî ya Demokrat a Sûrî, Koma Peymangira Rûmet û Mafan ,Û partiya Pêşverû ya Kurd li Sûriyê. Ji bilî ku rola jinê û heb [na wê di kongirê de balkêş bû, û xanim Îlham Ehmed wek hevserok ji Encumena Sûrya Demokratîk hat hilbijartin. Lê belê bi tevahî, mora TEV-DEMê aşkere li ser xûya bû.

Kongirê avêtina Beşar El Esed wek merc danenî. Ew dibînin ku gerek e sazûmana zordar ji holê rabe, û sûriyeke demokrat, pireng, parlemanî û nenavendî were avakirin. Sebaret pêkhateyan Sûriyê jî weha dibîne: (Erê ji curerengiya civakî ya sûrî re, û ji lêmukûrhatineke destûrî ji gelên Kurd, Suryan, Turkmen, Ermen û Çerkez re, û erêkirin ji çareserkirina dozên wan ên demokrat û dadmend li gor peyman û belgeyên navnetewî di destûrê de. Ango, ew li pirsên hemî pêkhateyên sûriya, ji bilî gelê Ereb, wek hev dinêre û çareseriya doza wan jî wek hev dibîne. Lê kongira Dêrikê, wekî ku li sûryê li dar ket, pêngaveke navxweyî ye li ser riya pêvajoyeke dirêj ji kar û xebatê re. Û ji bo çareseriya aştiyane jî gaveke baş e. Ji ber ku, ji bo sûriyê bi tevayî û çareserkirina qeyrana wê, bîna demokratiyê jê tê.

Li dawiyê, tê dîtin ku çawa guhertinên dirametîk, û bi lez û mezin li rojhilata navîn û bi taybetî jî li sûriyê çêdibin. Wêlomê jî, ji hêzên kurdistanî û bi taybetî li Rojavayê welêt tê xwestin ku bersiveke erênî di van rewşên zehmet de, ji bo gelê xwe bidin. Ew bersiva jî di lihevkirin û yekrêziya me ya stiratîcîk, û di karanîna diplomasiyek çalak û nerm de ye.

# Tirkiyê Çi Ji Kurdan Dixweze?

Merwan Berekat

Dema mirov siyaseta dewleta Tirkiyê dişopîne, birastî ew digîne encamekê ku rayedarên Tirkiyê roj bi roj çavên xwe di Kurdan de sor dikin, û hewil didin ku wekî pir caran dîsa Kurdan ji ev derfeta zêrîn bêpar derxin. Lê ew ji bîr dikin ku ev ne sedsala bîsta ye, û Kurdan ta astekê hajî xwe û hajî hin lîstokên neyarên xwe jî hene. Ji aliyekî din ve, ji bîr dikin ku îro Kurd xwedî hêzine leşkerî ne, û ji aliyê dîtir ve jî, Kurd li rex wan hêzan, ji karên diblomatîk re amade ne û ji bo têkildariyên bi dewletên cîhanê re jî ne di xew de ne.




Bi derbasbûna Rûsiya re, rola Tirkiyê di qeyrana Sûriyê de lawaz bû, û wek tê xuyankirin û li gor pirojeyên ku li vir û li wir, ji bo çareseriya qeyrana Sûriyê tên pêşkêşkirin, û rûniştin tên lidarxistin, Tirkiyê di wan de bê rol e, û ew nemaye wek aliyekî ku divê hertim şêwir pê re were kirin.

Rayedarên Tirkiyê baş dizanin ku Rojhilata Navîn li ber guhartinine mezin e, û destên dewletên mezin di pişt van guhartinan de ne, û ew gihîştine wê baweriyê ku Kurd ji van guhartinan bêpar dernakevin, ji ber wê jî Tirkiyê bi hemû awayan şerê Kurdan dike.

Ev bû meheke li piraniya herêm û bajarên Bakurê Kurdistanê wek Nisêbîn, Amed, Silopî…H.W.D şer bi Kurdan re tê kirin, bi sedan Kurd hatine kuştin û herweha jî birîndar hene, ji bilî binçavkirina çalakvanan. Di vê navberê de Serokwezîrê Tirkiyê Dawûd Oxlo di gotineke xwe de dibêje: Em dostê Kurdan e, ji ber wê jî, Kurdên Rojavayê Kurdistanê hawara xwe ji me re rêdikin ku em wan ji zordariya P.Y.D xelas bikin!???

Rojane Kurd bi çekên leşgerên Tirkiyê tên kuştin, vêca serokê wezîrên wê jî dixwaze Kurdan ji Kurdan biparêze !!!? Ma gelo ev yek ne ji seyrên sedsala bîst û yekê ye? Rayedarên A.K.P û li ser serê wan Ardoxan dema digot: Beşar Elesed nema ji aliyê gelê Sûriyê ve tê pejirandin ku rêveberiya Sûriyê bike, ji ber ku ew welatiyên xwe dikuje û bajaran bombebaran dike, ma ne îro ew jî welatiyên xwe yên Kurd ên sivîl dikuje, di nav wan de jin û zarok jî hene, û bajaran jî bombebaran dike.


Ji destpêka şoreşa Sûriyê de, Tikiyê hewil dida ku roleke serekîn di Sûriyê û herweha di herêma Rojhilata Navîn de bilîze, ji ber wê jî, piraniya kes û aliyên xwe wek rêvebirên şoreşê didîtin, li Stenbolê kom kirin û bi cîwar jî kirin. Lê xewna rayedarên A.K.P ji bo herêmeke ewle ya ku wan li seranserî bakurê Sûriyê dixwest neçû serî. Ji ber ku lîska qeyrana Sûriyê kete destên mezinan. Tirsa Tirkiyê ne ji tiştekî ye, tenê ji Kurdan e, ku Kurd li hev bikin û rêvebiriya xwe ya ku heye biparêzin û herêmên kurdî yên Rojavayê Kurdistanê bigînin hev, Belê; tirsa sereke ew e. Ji ber wê jî, Serokê Tirkiyê Receb Ardoxan dibêje: Eger Kurd hewildanine weha bikin, emê wan dêris bikin.

Bila di bala rayedarên A.K.P û yên di xeleka wan de be, eger ew bi çareseriyeke aştiyane bi Kurdan re li hev neke, tucarî Tikiyê aramî û hêminiyê nabîne, ji ber ku ev bûye sî sal şer di navbera rêjîmên Tirkiyê û Kurdan de tê kirin, û bi deh hezaran jî qurbanî ji her du aliyan hatine dan, lê encam tenê xwînrijandin e. Û tucarî bi xwînrijandinê çare netên danîn. Ya din jî, ma gelo, gelê Tirkiyê razî dibe ku xwîna xort, keç, jin û mêrên Kurd, Tirk û pêkhateyên din ji bo berjewendiyên hin kesan û partiya A.K.P were rijandin?. Ji ber wê jî dê baş be, eger rojekê pêş de, ev şer were rawetandin, ta ku Tirkiyê jî nebe Sûriyeke din.

Nêrîna Azad

# Kîjane Rast e?

▪ Şêrwan Berekat



Kurdistana Sûriyê, Başûrê Biçûk, Kurdên Sûriyê, herêmên Kurdî li Sûriyê, herêmên ku ji pirpêkhateya Kurdî pêk tên….. û Rojavayê Kurdistanê. Ev hemû têrm û nav ji aliyê rewşenbîr, nivîskar, sekretêrên partiyan û di naveroka pirogramên partiyan de bi kar tên. Ma gelo ji van binavkirinan kîjane rast e, yan tev ne rast in??

Ji destpêka damezirandina yekem partiya siyasî ya kurdî li Rojavayê Kurdistanê, û ta niha tevgera siyasî ya Kurdî bi hemû partiyên xwe nikarîbûn li ser navekî li hev bikirana!? Dîsa pirsek xwe beloq dike û ew jî ev e: Ma sedema vê yekê çi ye, û ji bo çi ta niha, nikarin wek rastî heye bibêjin?! Ji wê seyrtir, hin jî hene ne tenê bilêvkirin, lêbelê di nivîsînên xwe de jî (Kurdistana Bakur, Kurdistana Başûr, Kurdistana Rojhilat û Kurdistana Biçûk) bi kar tînin. Watedayîna wê, yanê çar Kurdistan hene!!!

Herweha dema mirov navên partiyên Kurdî yên li Rojavayê Kurdistanê jî dide ber çavan, gelek pirsên ku mejiyê mera çep û rast dizêvirînin xwe davêjin qada pirskirinê. Lê ta niha jî bersiv jê re nehatine danîn. Ev jî bi xwe pirseke mezin e. Wek nimûne: Partiya…….. li Sûriyê, Partiya….. Sûrî. Hin partî jî hene, ne (Kurdî) û ne jî (Li Sûriyê) yan (Sûrî) di navê wan de heye. Baş e; belkî di dema damezirandina van partiyan de, berjewendiya xebatê weha dihate xwestin, an jî, ji bo parastina gel ji zor û çavsoriya rêjîmên şofen bû. Lê çima navên van partiyan di naveroka pirogramên wan de nehatine şirovekirin, û ew di nav dûmaneke tarî de hatine jibîrkirin?? Tevlî ku hemû partiyan têrma demokratiyê xistine navên xwe, belkî jî, di navê çend partiyan de nehatibe, lê sedema wê ne ji ber tiştekî ramyarî, aydiyolojî yan jî guhartinine cuda di rêbaza xebata wan partiyan de heye. Na; tenê ji bo navê wê partiyê ne wek ya ku ji wê qetiye be, ya din belkî jî ji piraniya partiyan nav bûne pirsgirêk. Li van çend salên dawî, hin partiyan (Kurdistanî) xistin navê xwe, lê Sûriya nehate rakirin. Çima? Bersiv li cem wan e.

Rastiyeke dîrokî heye, ew jî tucarî çênabe ku were badan yan jî guhartin, belê ew rastî jî ev e: ***Kurdistan wek xaknîgarî yek e***. Lê ew ji aliyê dagirkeran ve du caran hatiye dabeşkirin. Cara yekê li sala 1514an di navbera Imberetoriya Osmanî û ya Sefewî de, çara duyem jî di sala 1916an de li gor hevpeymana (Saykis-Bîko) bû. Ma gelo çêdibe ku Kurd bi dabeşkirina Kurdistanê û ew sînorên derewîn ên ku neyar û xêrnexwezên Kurdan bi pîlan danîne, bawer bikin?

Ya din, aliyên ku Kurdistan dagîr kirine, bi wê dabeşkirinê tenê razî nebûn, lêbelê piroje, pilan û pîlanên wan ji bo guhartina dîmografiya Kurdistanê nehatin rawestandin, û hîn jî berdewam in. Ma gelo çi demê, û çawa pêkhateya Erebî li Rojavayê Kurdistanê bi çîwar bû? Rast e; di navîna sedsala bîstan de, hin ji Ereban ji bo çêrandina sewalên xwe, berê xwe dan Rojavayê Kurdistanê, û ji ber ku hin pêwendî jî di navbera wan û hin êlên Kurdî de hebûn, ew nema li welatê xwe vegerîn, û hin jî wek cotarî hatin, û piştre zevî kirîn û man. Lê eger em vegerin salên şêstî û vir de, çi û kê hîşt ku rêjeya pêkhateya Erebî di Rojavayê kurdistanê de bilind bibe? Û çima bi hemû awayan, ji aliyê rêjîmên ku destlatdariya Sûriyê dikirin, û nemaze ya Elbe`s piştgiriya vê pêkhateyê dikirin, û hîn jî nehatiye rawestandin? Ma wan gundên Kurdan, an jî beşek ji gundan ji Kurdan standin û radestî Ereban kirin? Ne ji mêj e, piştî sala du hezarî û vir ve, bi dehan pirojeyên şûfen ji aliyê rêjîma Elbe`s ve, ji bo guhartina dîmografiya Rojavayê Kurdistanê hatin danîn, û yek ji wan ev bû: Çênabe ku welatiyekî ji pêkhateya Ereb ku li Rojavayê Kurdistanê ne, erdê xwe bifroşe welatiyekî Kurd. Lê eger welatiyekî Kurd bixwesta erdê xwe bifrota yê Ereb, divê bi hêsanî û zû li ser navê wî bihata tomarkirin. Û her weha bi dehan biryar û pirojeyên wisa hatin derxistin. Ez bawer dikim ku yek Kurd li Rojavayê Kurdistanê nîne ku vê yekê nizane. Lê mirov tênagihê çima hin ji rewşenbîr, siyasetmedar û rêvebirên partiyên kurdî Rojavayê Kurdistanê bi (Herêmên pirpêkhateya Kurdî) bi nav dikin!!? Belê; eger ew (Rojavayê Kurdistanê ) wek nav nikarin bipejirînin, an jî ne rastiyeke dîrokî ye, ma gelo eger (Herêmên kurdî) yan jî (Herêmên Kurdî yên ku rêjeyek ji pêkhateya erebî di wan de heye) were gotin, wê hinekî ne siviktir be?? ……. ❻

# Birçîbûn Riya Derçûnê Ye

Dr. Muhamed Zeyno-Almaniya

Di koka civaknasiyê de metnekî sereke heye, weha tê bi lêv kirin. Heger desthilatek an hêzek an axe û begek bixwez e dijberên xwe bêhêz bike, wan sist bike an helwesta wan pûç bike, pêwîst e berî her tiştî şer û pevçûnan li dijî gepa nanê zik bike. Mebest ji vê gotinê ew e ku mirov berî mejî û seriyê xwe bi zikê xwe raman dibe.. Heger hat û helwesta mirovan xurt bû li beramberî desthilatê û bi demê re gumreh bû û giha asta guherînên mezin ku gelek bend û stûnan bi xwe re dihêre û ji holê radike û desthilat nema dikane bi riya leşker û zorê rê li ber tevgera cemaweran digire, ew çeka herî xurt û bi saw bi kar tîne; çeka ku gelekan ji rê dişimitîne û gelekan jî diwestîne û xwe radestî bêçariyê dike. ..

Heger hat û ew cemawer bê rêberî ma û ew di helwesta xwe de bê armanceke diyar û eşkere ma, û bi ser de jî kirasê dîrokê lê pêçan, hindê ew cemawer bi lez li çareseriyan digere û her ku rê û armanc û silogan û rêberî û bername û berdevkên wan pir bûn, ewqas ew cemawer di nav keftilefta xwe de wenda dibe û desthilat bi ser dikeve.

Di dîroka şoreşan de ev resenî baş diyar dibe. Her wiha dîsa jî cemawer xwe radigihîne û berxwe dide û xwe kom hev dike û hesret û sewda jiyana azad û aram vedijîne û careke din li hember zorê radibe.... Lê dîsa jî dîrok dide xuyakirin ku ew cemawer li hember birçîbûnê bê hêz e û xebata ji bo azadiyê lewaz e. Birçîbûn çeka herî dînwar e. Birçîbûn rewşa herî zehmet e. Birçîbûn neyarê herî xurt e. Birçîbûn piştan qiloç dike, hîman dileqîn e, pozbilindiyê nizim dike. Birçîbûn ramanan tevlî hev dike, ew mirovan ji mirovantiyê dûr dixe, ew mirovan ber bi hovîtiyê ve têve dide. Heger hat û di welatekî de birçîbûn bû serdest û rihên xwe di nav hiş û ramanan de berdan, hindê qîret û mêranî û tewrîk nezerî û gotinên pirtûkan bê wate dimînin, rûmeta mirovan bê buha dimîne, mirov tûşî her xirabî û bêbextiyan dibe, ew ji giyan û kiyanê xwe derdikeve, ew dikare her helwestekê bike bêyî ku li encamên karê xwe binêre, lew re ew kor e û ne li ser hişê xwe ye. Hilweşandina civakê û têkela têkliyên civakî di bin saya rewşa birçîbûnê de têk diçin û hildiweşin, civak tarûmar dibe, malbat xerîb dibin, xizim û kesên hev ji hev cuda dibin. Birçîbûn mervantiyê nas nake.... Mirovê zor û zordariyê tehemul dike, ew nebûna azadiyê dikane bipejirîne, lê li beramber birçîbûnê bê hêz e.



Lê belê, şehîd û fedekarên gelê me û hemî gelên cihanê, digel birçîbûnê û xizaniyê, na belê ji bo tunekirin û têkbirina wan ş ji bona azadiyê û parastina rûmeta mirov, berê û niha û herdem jî, jiyana xwe dane, didin û amade ne ku hertim jî pêdar û xebatkar bin.

## Kîjane Rast e … Dûmahîk

Ma gelo dema em li dîrokê vegerin û wê baş bixwînin Efrîn, Kobanê, Cezîrê û herêmên di navbera wan de jî, ne bi ser Kurditana mezin ve ne?

Dîsa guman nîne ku mijareke weha giran û nirxedar bi gotarekê têr nabe, lêbelê lêkolîn û vekolîneke pir berfireh gerek e wê ye. Lê ev tenê wek agahdariyekê ye, divê partiyên kurdî yên Rojavayê Kurdistanê bê derengî lêvegerekê ji nav û pirogramên xwe yên siyasî re bikin. Û di wê de rastiya kurd û Kurdistanê bidin xuyankirin. Û li pêşî, berê xwe bidin lêkolînên akadîmîk di derbarê rastiyê rojeva îro ji bo pêşerojê, ji ber ku parastina berjewendiya pêvajoya doza gelê Kurd li Sûryê xwedî teybetmendiyekê ye, ku hêjayî rêzgirtinê ye.

## Civata salane … Dûmahîk

Li destpêkê mamoste Hekîm Ehmed bixêrhatina mêvan û nûnerên herêmên saziyê li Cezîrê kir. Vexwendî demeke bê deng li ser giyanên pakrewanên Kurd û Kurdistanê rawestîn.

Gotina komîta Rêvebir ya Saziya Fêrkirin û Parastina Zimanê Kurdî li Sûriyê (Parêzgeha Hesekê), ji aliyê mamoste Nûşîn Bêcirmanî ve hate xwendin, tê de bixêrhatina mêvan û endamên civata salane kir, û li ser giringiya ziman di hebûna miletan de û kar û barên ku saziyê li ser milê xwe girtiye anî ziman û li ser amadebûna saziyê ku alîkar be bi hemî saziyên zimên û çandeyî re jî tekez kir.

Gotina Partiya Yekîtî ya Demokrat a Kurd li Sûriyê (YEKÎTÎ), ji aliyê mamoste Mistefa Meşayix cîgirê Sekeretê partiyê ve hate pêşkêşkirin û tekez li ser piştgiriya partiya wan ji hemî sazî û komeleyên di ber zimên de xebatê kir...... Nama Saziya Fêrkirin û Parastina Zimanê Kurdî li Sûriyê( Şaxê Efrînê ) ji aliyê mamoste Zekî ve hate xwendin û wilo jî nama Fêrkirin û Parastina Zimanê Kurdî li Sûriyê li Kobanê (Mala Kemal Henan ) jî ji Aliyê mamoste Canda Erefat ve hate xwendin.

Gotinên din ku hatin xwendin jî ev bûn:

1- Yekîtiya Nivîskarên Kurd li Sûriyê, helbestvan Dilbirîn.

2- Helbestek ji aliyê Helbestvan Mehfûz Reşîd ve hate xwendin.

3- Yekîtiya nivîskarên Kudistana Sûriya Mamoste Torçîn.

4– Gotinek ji Aliyê mamoste Behcet Begê.

5- Gotinek ji aliyê B.Hozan ve.

6 – Gotinên Herêmên Saziyê li Parêzgeha Hesekê: ( Komîta Erebê Şemo ) ji aliyê mamoste Şems B.Eta (Dêrik û Girkê Legê) .... ( Komîta Celadet) ji aliyê mamoste E.Kerîm Mişko (Tirbespî û Aliya ) ......( Komîta Şermola ) ji aliyê mamoste Lîlav (Amûdê).... ( Komîta Hesekê ) mamoste Dilşad Ebdo......( Komîta Rewşen ) ji aliyê mamoste Hemîd (Dirbêsiyê )... ( Komîta Nefel) ji aliyê mamoste Idrîs Şingalî (Qamişlo).

Birûskên ku gihane Civatê jî ev bûn:

- Rêxistia Jinê Tirbespiyê ya PYDKS.
- Komela Evîn ya alîkariyê.
- Ehmed B.Omîd ...Elmanya.
- Prtiya Yekîtiya Demokrat PYD.
- Komela Comerd ya Alîkariyê.
- Navenda Karûbarên Rêxistina Mirovane.
- Serdar B.Saman Elmanya.
- Rêxistina Stêr ya Geşepêdanê.
- Şaxên Raman, Palo, Ronahî û rêxistina jinê ya PYDKS li Qamişlo.
- Desteya Rêvebir ya Kovara Welat.
- Komîteya Perwerdeya Civaka Demokratîk.
- Koma Şanê Li Qamişlo.
- Rêxistina Hesekê ya PYDKS.
- Komela Subartu ya çand û dîrokê.
- Koma Mîdya ya filiklorê Kurdî.
- Necah Hêvo berpirsa Yekîtiya Jina Kurd (RÛDOZ).
- Partiya Demokrat a kurdî li Sûriyê (ELPARTÎ).
- Komela Aferîn ya jina kurd.
- Rêxistina Mafê Mirovan (MAF)
- Mala Mandêla.

Piştî belavbûna mêvanan civatê karê xwe berdewam kir, mamoste Dilovanê Deştê rapora Komîta Rêvebir xwend û danûstandin li ser rewşên heyî çêbû .

Di dawiyê de, Komîta Rêvebir ji saziyê re li (parêzgeha Hesekê hate hilbijartin .

*Qamişlo 25/12/2627 K/ 2015 Z*

**Saziya Fêrkirin û Parastina Zimanê Kuerdî li Sûriyê (Parêzgeha Hesekê)**



# Nakokiyên Bûk û Xasûyê û Rewşa Jinê

## Vejîna Kurd

Şerê bûk û xwesûyê nakeve xizmeta doza jinê. Dijayetî û lihevnekirina di navbera wan de mijareke pir kevnar e. Ew di nav hemû ast û pêkhateyên civakê de tê dîtin û gengeşekirin. Ew nakokiya (dîrokî) li civakên me yên rojhilatî heya roja îro hîn bi dawî ne bûye. Xwesû bi awayekî serwerane danûstandinê bi bûkê re dike. Ew dixweze wê bixe bin fermana xwe û jiyana wê nexweş bike. Bûk jî serweriya (şîret û gotinên) wê pîrejinê napejirîne û dixweze wê bide aliyekî û tune bike.

Di pir malbatan de, dema mêr digihê malê, ji neçarî guhdariya sernûçeyên wî şerî dike, carina piştgiriya aliyekî dike û herweha êzingan li êgir zêde dike. Lê pir caran jî wan tiştan di piştguhê xwe re davêje û reva ji malê wek çareserî dibîne!!! Lê eger pêwendiyên bûk û xwesûyê serast dibin, di malê de heyama xweşî û şahiyê peyda dibe, û gotina: ((Bûk çê ye, xwesi dê ye)) pêk tê. Birastî ev dijayetiya jinê ji jinê re mirov matmayî dike û herweha gelek pirsan bi xwe re derdixe holê, nemaze dema ku jin doza azadiya xwe dike û zordariyên li ser jinan şermeze dike.. Ma gelo şerê bûk û xwesûya ne yek ji şêweyên zordarî û bindestkirina jinê bi xwe ye?!!

Çima jin tenê mêran sûcdar û tewanbar dikin û ji xwe de dest pê nakin?!! Bi ya me be, ev tê wê wateyê ku ne tenê mêr, lê jin jî dibin kelem li pêş serkeftina doza jinê. Divê her jinek, eger bûk be yan xwesû be, dil û hişê xwe ji dijayetiya jinê bişo û bi zimanekî xweş û dilovan pêwendiyê bi hev re bikin, daku mêr jî rêzdariya wan bigirin.




Belê.. di tabloya doza jinê de, nakokiyên bûk û xwesûyê şermeke mezin e. Ta jin kanibin bi gavên durust dest bi karê xwe bikin û rola xwe di civakê de bilîzin, divê ew pêwendiya nebaş ji holê rabe.. wê hîngê mêr jî wê piştgiriya jinê bike, û jin jî wê ji hev hez bikin, ji hev re bibin piştgir û berve serkeftinê biçin.

## Parêzer ….. Dûmahîk

Mamoste Nûrî Arif Seydo Mêmî ji xwendevanên seretayî bû ji Çiyayê Kurmênc- Efrîn, ku şihada parêzeriyê ji zanîngeha Şamê wergirt. Ji hêla siyasî de jî, ew ji dawiya salên çelî de ji sedsala bîstan, di xebatên perlemanî de li Çiyayê Kurmênc çalak bû. Ew gelek caran wek namzet dadiket hilbijartinan. Li dema yekîtiya Sûryê û Misirê bû endamê meclîsa navça Efrînê û li gel hevalên xwe nûnertiya wê li Qahîra kir. Piştî jevketina yekîtiya Sûryê û Misirê, ew di hilbijartinên sala 1962an de bi ser ket û bû endamê perlemana Sûryê. Û li sala 1964an bû sekretêrê sandîka parêzeran li Helebê. Li sala 1973an jî, digel hemî zext û zorên têvel, li ser lîsta Tevgera Kurdî daket hilbijartinên perlemana Sûrî lê ji ber nedurustiya karnava hilbijartinê bi ser ne ket. Mamosteyê dilovanî Mihemed Nûrî Arif derdora pêncî salî karê parêzeriyê li Helebê û Efrînê kir, ew tê de serkeftî û dilsoz bû jî. Wî li sala 2005an kurtpirtûkek bi navê (bîrweriyên pêvajoya jiyana min) bi zimanê Erebî nivîsand û hejmarine hindik li dost û hevalên xwe belav kirin. Tê de hûrmûr û gelek tiştên veşartî û giring ji rewşên hilbijartinên ku li wan deman li navça Efrînê dibûn diyar kirine û nakokiyên malbatên Çiyayê Kurmênc û namzetan jî dane xuyakirin. Bi rastî jî, ew ji dîroka navça Efrîn re, di gelek waran de, belgenameyeke zor hêja ye.

Di wê kurtepitûkê de li ser zimanê gorbuhştê me wiha hatiye: ((Ez


مذكرات مسيرة حياتي

الإهداء

روح فقيدي الغالي وملاكي ولدي كاميران

الذي رحل عني وهو في ريعان شبابه

تأليف المحامي محمد نوري عارف

ji dîrok û rastxwaziyê re dibêjim, û bila dîrok ji gelê Kurd re bibe dersek, gerek e em dexsî[hesûdî] û diltengiya ji hev re berdin, û eger sedem û nîr çi bin jî, bila em bibin yek, ji hev re alîkar bin û li hev bikin…)).

**Bila serê malbata dilovanî û serê dost û hevalên wî xweş be.**

# *Ez saziya ziman im*

**Nûşîn Bêcirmanî**

Bawerkin ez ne helbestvan im, lê bi tenê

Çiqulek nû şîn im ji saziya ziman im

Li Serheda , ji ava zelal min pir vexwar

ez narizim,  li Qamişlo hê reh şîn im

tîpê bav û kalê xwe, bi çavan diparêzim

leşker im îro li vê dê, ez tim li karim

li her cih û warî fêrkirin karê min e

ji xelkê xwe re kulîlkên tim li darim

ez ji ferhenga Celadet meyê dinoşim

li baxê Erebê Şemo tim ez şiyar im

Reşîdê Kurd çira li ber zimanê mine

wan pendê wî diparêzim, û lê guhdar im

li Efrînê dengê min e, li Kobanê tim heme

ez gula diçinim, peyxemberê ziman im

li Dêrikê Erebê Şemo, Tirbespî pêla Dicla ye

Amûdê pênûsa min e, li vir ez Şîndar im

Abe ya min sî û yek kulîlkê reng sor in

ji her kulîlkê re helbestên xweş dirêsim

li Qamişlo pênûsa min dengê xweş  veda

li her cihî ez  berf û baran û buhar im

Bawerkin ez nehebestvan im, lê bi tenê

Çiqulek nû şîn im ez ji Bêcirman im

Ji xama saziyê, li şagirtan  roja geş veda

ez li vir tim sergovend û tembûrvan im

bi bêdengî ji zimên re vî karî dikim,

Ez peyv û kar im bawerkin ne pir bêj im

tev li zimanê xwe guhdar bin delalê min

ez bi we re xizmetkar û hem sazvan im

xweş bawer bin ez ne helbestvan im

ez im dengê saziyê bi awaz û bilûrvan im

15/5/2627K/ 2015 Z

# *Ziman Tewandina Navdêran*

Tewandina navdêran di rêzimana kurdî (zaravê Kurmancî) de mijareke pir giring e. Risteke wê ye bingehîn di warê rastnivîs û nasandina zayend û mêjera navdêran de heye. Lê ev mijara giring, hîn rind zelal ne bûye, û di nivîsê de bi şêwakî rast û durust pêk ne tê. Loma jî em dikevin gelek şaşiyên vekîtê, û herwiha xwendin û têgihîştina wateya hevokan jî.

**Tewandin(Verês, çivane) çî ye?**

Tewandin rewşeke veguhastina navdêr û bêjeyên mîna wê ne, mîna: *Rader*, *jimarnav û cinav*. Di rewşa tewandinê de, navdêr li gor zayend û mêjera xwe: Yan parkîtên tewangê werdigirin. Yan  jî hin tîpên xwe bi hinên din diguhêrin.

**Çawa navdêr tê tewandin ?**

Navdêr bi pêxistina van parkîtan tê tewandin:

**Ê**: Ji bo yekejmara zayenda mê .

*Ez şêrînê dibînim.*

*Ez keçekê dibînim*.

**Î**: Ji bo yekejmara zayenda nêr.

*Ez hespî dibînim.*

*Ez hespekî dibînim.*

Lê ji bona tewandina navdêra bîna ya nêrza, eger tîpek ji tîpên wê (e) yan (a) be, çêdibe û rastir e, ku (e) yan (a) ya dawiya navdêrê bi tîpa (ê) were guhertin.

*Wekî* **:** *Azad* **:** Ez Azêd dibînim .

*Hesp* **:** Ez hêsp dibînim.

**An**: Ji bo gelejmara her du zayendan.

*Ez keçan/xortan dibînim.*

Lê di navdêra *nebîna* de, tîpa (n) ji (an) a gelejmariyê dikeve, û parkîta tewangê dibe (a).

Ji dêvla **:** *Ez keçinan û ew xortinan dibînim.*

Wiha dibe**:** *Ew keçina û ew xortina dibîne.*

-Carina (a) ji navdêra *bîna* jî dikeve:

*Karê me li ber çavan e*

*Karê me li ber çava ye.*

**Kînga tewandin çêdibe ?**

**1.** Gava navdêr kirarê lêkera têper متعدي be, di dema borî de.

*Şêrînê, xortekî û hevalan helbest xwendin.*

**2.** Gava navdêr biresera durust ya lêkera têper be, di demên wêbê, niho û raweya fermanî de .

Niho**:** *Memo keçekê, Ferhêd û hevalina dibîne.*

Wêbê**:** *Winê keçekê, Ferhêd û hevalina bibînin*.

Fermanî**:** *Memo! Keçekê, Ferhêd û hevalina bibîne!*

**3.** Gava navdêr biresera ne durust be di hemî deman de.

*Ez ji bajêr bi makînekê hatim.*

**4.**Gava navdêr biresera-palvedêr مضاف اليه navekî din be.

*Birayê Binefşê.* *Xwîşka Ferhêd.*

Navdêrên ku li dû hev hati bin, û ji yek mêjerê bin, çêdibe tenê navdêra paşiyê, li gor zayend û mêjera xwe were tewandin.

Herwekî :*Ez Azad, Şêrîn û welêt dibînim.*

# Stirana Kurdî, Ardiwa Jiyanê

▪ Hekîm Ehmed



Di dîroka civaka Kurdî de stiran weke pêdiviyeke jiyanê xuya dike. Kurd li kûderê bin, stiran weke ba û nên û avê bi wan re ye. Ji destpêka jiyanê û ta mirinê, hestên germ û hêzên xurt dide mirov. Ew di jiyan, çêj û wateyên mirovane, di şahî û şînan de, di kar û vehesanê de, di navtêdan û reşbîniyê de, stiran awayê derbirînê yê kêrhatî bû.



Bi stiranê dayik zarok dilorîne, ji ber wê ew dibe awayê danûstandinê yê destpêkê û di dilê mirov de xwedî bandor dimîne. Ji wê bêhtir jî ku piraniya dayikan li ber dergûşê hemû axaftinên xwe bi şîrmijan re bi awaz dikin û bi dirêjkirina lêvkirinê û rengdana deng, dikarin bala zarok bikşînin û aramiyê derbas dilê wê bikin.



Wilo stiran di qonaxên jiyanê de berdewam dibû. Di lîstikên zarokan de jî beşdar bû ku gelek ji wan lîstikan li ser stiranekê saz dibûn. Paşê di şevbuhêrkan de stiran dibû behaneya komcivînê û mêweya her demsalê, çi li ser evînê û êşên evîndaran ba, çi li ser şer û serpêhatiyan ba ku pendyarî û nirxên civakê bilind dikirin.

Di kar de jî, kultûra Kurdan bi stiranên rengereng dixemile, taybetiya her karekî heye, stiranên destar ne weke yên meşkê ne, û ev ji yên mêkut başqe ne, her wiha stiranên paleyan û yên şivan û bêrîvanan jî ji hev cuda ne.

Ji aliyekî din ve, di şahiyan de û bi taybetî di şahiyên zewacê de, stiranê cihê xwe yê herî giring digirt, şahiyên ku di dîroka Kurdan de heft rojan berdewam dikirin bi stiranan dihatin berdewamkirin, her dîmenek ji xwestinê de ta hinekirinê û guhestinê, stiranên xwe yên taybet hebûn, xemilandin, çûna himamê, derxistina ji mala bavê, derbasbûna mala zavê û pêşwaziya mêvanan hemû bi stiranê dihatin şopandin, ji bilî stiranên govendê ku her cureyekî dîlanê bi sedan stiranên xwe hebûn.

Tiştê balêş ku di şînan de jî, stiran derbirîneke serkeftî bû, di behiyan de Kurd bi stiranê digirîn û jinan kul û xemên xwe bi awayekî trajîdî ku dilê her mirovî dişewitî û gelek caran nikarîbû hêsirên xwe veşêre diristin.


Em ji bîr nekin ku di cengan de, şervanên Kurd bi stiranî berê xwe didane meydanê, bi navtêdanê dihatin oxirkirin û serkeftin bi tilîlî û awazan dihate pêşwazîkirin.

Di serdema borî de jî, dengbêj û hunermendên Kurdan roleke mezin û bandoriyeke hêja di bîrewerî û hişyariya kurdperweriyê de pêk anîn.



Wilo stiran alava jiyanê bû, awayekî hebûnê ku di her rewşê de û bi her bûyerê re peyda dibû. Lê giringî ew e ku ev hevalriyê dilsoz bûye dîdevanekî rastgo ji hûrguliyên jiyana Kurdan re di dîrokê de, wêneyeke zelal ji xurista welat û şaristaniya gel re. Bi nêrîna me di rewşa tinebûna jêderên rast li ser dîroka Kurdan ku desthilatên qirêj dixwestin vî navî ji dîroka gelan hilînin, stiran dibe belgeyeke bêhempa ku di hiş û bîra mirovan de hatiye hilanîn, helbet pêwistî bi lêkolînan heye da ew agahî bibin ciyê bawerî û spartinê, ev li ser milê rewşenbîr û lêkolerên îro stûbariyeke mezin e.





# Gelên Rojhilata Navîn li serdemên dîrokî

Rozad Elî

Zanyarên dîrok û netewnasînê, gelên Rojhilata Navîn a Kevin li ser sê komên sereke parve dikin: 1.Gelê Somerî. 2.Malbata Gelên Samî. 3.Malbata Gelên Çiyayî. Li gor lêkolînên dîrokî, ew her sê komên gelan ji hêla wargeh, nijad û zimên de ji hev cuda ne. Lê belê di nava hezar salan de, û bi sedema sînordariya xaknîgarî û veguhestin û hemsîtiya şaristanî, di gelek waran de têkliyên têvel di navbera wan de çêbûne, wek pergalên kesayetiya mirov, ol, çande û ta radeke bilind zimanên wan jî ketin bin bandora ew têkliyên dîrokî yên demdirêj.

**1- Gelê Somerî:**

Gelê Somerî şêngeh, bajar û qiraltiyên xwe li beşê Başûr ji welatê Mêzopotamiya, ango li navçeyên Başûrê Êraqa niha ava kiri bûn. Nêrînên têvel sebaret binyata nijadî ya vî gelî hene. Hineke dibêjin ew ji malbata gelên Samî ye, hinek jî mêlag dikin ku ew ji koka xwe de ji malbata gelên Çiyayî ye, û dibêjin jî komên wî yên pêşîn ji navçeyên çiyayên Zagrosê daketine Başûrê Mêzobotamya. Lê belê eger rastî li kû be, Somerî gelê yekê ye ku mîrîtî û dewletên bajaran ava kirine, û "Nivîsa Mîxî" a ku di dîroka mirovatiyê de navdar e afirandiye, û bi riya nivîsê, dîrok, ziman û navên qiralên xwe nemirî kiriye û sermiyanek mezin û zor hêja ji nivîsarên têvel jî li ser jiyan, bawerî, çand û şaristaniya xwe ya li dirêjiya bêtirî 1500 salî tomar kiriye.

**2- Malbata gelên Samî:**

Warê van gelan Nîvgirava Erebî bû. Nijadzan dibêjin, ew gel ji yek nijadê ne, û bi zimanên nêzîk hev daxivîn. Ji wan miletan: Fînîqî, Ibrî, Aramî, Babilî, Ekedî… Û gelê wê ê nêzîktir gelê Ereb e.

**3- Malbata Gelên Çiyayî:**

Warên wan ên kevin çiyayên Zagrosê, derdorên wan û beşê Bakur ji welatê Mîzopotamiya ne. Zanyar Gelên vê malbatê li ser du astên dîrokî parve dikin:

**-Gelên asta yekê:**

Gelên asta yekê, gelên Zagrosê ên kevnar in. Gelên navdartir û kevintir ji wan ev bûn: Lolo, Gotî, Kasî, Xaldî, Orarto, Sobarto, Horî-Mîtanî. Li gor baweriyên zaniyaran, gelên asta yekê ji aliyê nijad û zimên ve pir nêzîk hev bûn.

Dîroka peydabûna wan gelan li Zagrosê ne diyar e. Lê zanyar guman dikin ku ew neviyên komên Kevnar ên mirovê Hişdar ê seretayî ne, û ji nijada mirovên Şanîderê û niştecihên Kurdistanê ên herî dêrîn in. Ew ji demên berî dîrokê de li navçeyên çiyayên Toros û Zagrosê, ango li navenda Kurdistanê dijîn û ji wan re bû bû war. Li gor belgeyên olî jî, ew gel neviyên pêxember Nûĥ û heştê kesên ku pê re di geştiyê de bûn. Mîna ku di çêroka olî de hatiye, ew li ser çiyayê Cûdî daketine û şêngehên xwe ên despêkî li wir ava kirine.


Ev asta dîrokî, hezarê sêyem û duyem ji berî zayînê dide berxwe. Gelê navdartir û nêzîktir ji wan, gelê Mîtanî-Horî bû, wî impretoriya Mîtanî- Horî a mezin li ser deverine fere ji Rojhilata Nêzîk damezrand.

**-Gelên asta duyemîn:**

Ev asta dîrokî ji destpêka sedsala yekê berî zayînê de dest pê dike. Li wê demê, goçine mezin ji gelên Arî (Hindo Ewrupî) ji derdora Bakurê derya Qizwînê berve Çiyayên Zagrosê û Kurdistanê hatin û lê bicih bûn. Gelên wê goçê ên navdartir ev bûn: Sikês, Kêmir û Med. Ji nav wan goçeberan, gelê Med ê herî mezin bû.

Medî li despêkê li deverên Rojhilata çiyayê Zagrosê bicih bûn, lê bi demê re bi rojava ve jî çûn, bi civakên gelên Zagrosê ên berê re têkel bûn, lê bûn serdest û desladar û ji aliyên regez û zimên de jî mora Arîtiya xwe li deverên Kurdistanê dan (E.Zekî, rûp 59).

Li wan deman, geline Arî yen din jî bi ser Bêla Êranê de hatine û lê bi cih bûn. Di nav wan de gelê sereke Pars bû. Di wan deman bi xwe de, goçine din ji deverên Bakurê derya Qizwînê bi aliyê Ewrupa û Hidistanê de jî çûn. Têkliyên nêzîk ku niha di navbera gelên Hind Ewropî de tên dîtin vedigerin wan deman, jixwe gelê Kurd yek ji wan gelên Hindo-Ewrupî ye.



# Rêbazên kurdî di navbera perwerde û siyasetê de



Rêbaza hînkirina zimanê kurdî ji bo asta seretayî ya ku rêvebiriya xweser dide xwendin, di kolana kurdî de bûye mijara nakokiyan. Nêrînek erê ye, nêrîneke din dijber e, û ya sisiyan jî di navbera erê û na de ye.

Rola herî mezin di hurhutandin û rûdawkirina vê mijarê de rêvebiriyên hinek partiyan e. Ta berî peydabûna wan rêbazan û xwendin û şopandina naveroka wan ji nêz ve helwestine neyînî tên girtin. Weke em zanin nirxandina mijareke wiha ji maf û stubariya perwerdevan, pispor û saziyên fêrkirina zimanê kurdî ye.

Dibistanan deriyên xwe vekirin û fêrkirin jî li gor rêbaza nû dest pê bû. Lê gengeşekirinê ji hin aliyên kurdî yên siyasî de bi awakî tûj û berçav derketin holê. Hinekan xwepêşandan li dar xistin, hinan jî ew mîna sedemekê ji koçberiyê re dest nîşan kirin.

Eger em neçar in ku vê mijarê li partîtiyê biparêzin û nirxandineke siyasî bidinê, emê jî ji aliyê xwe ve van têbînan xuya bikin:

1-Zarokên me pêşeroja me ne, gerek e em wan azad perwerde bikin, da ku kanbin rast vebjêrin û veqetînin. Emê gunehkar bin, ger em wan ji cûreyên zanyariyan, ramanan û rengan bêpar bihêlin, û em berê wan bidine şopeke bi tenê. Eger em neçar in, ku perwerdeya niştîmanî û netewî pêşkêşî nifşên nû bikin, divê ew ne yekalî be, ne bi aliyê kes yan hêz û partîkî de be. Ji ber ku em bawer in ku bîrdozkirina hîndariyê biçûkirina zaroktiyê û tevlihevî û çerxotekirina pêşerojê ye.

2- Raman û zanyariyên ku di riya rêbazên fêrkirinê re pêşkêşî zarokan dibin, divê werin hûrlêvegerandin û li gor temen û radeya têgihîştinê bêne vebijartin, da ku şagirt ji dibistan, mamoste û zanistê hez bike û pêve were girêdan, û bibe fêrkerekî baş. Lê tiştê xuya -li gor nêrîna hin pisporan- piraniya metiryalên ku ji aliyê rêveberiya xweser ve hatine erêkirin, têgihîştina wan zehmet e û gelek şaşî li pir ciyan tê de tên dîtin.

3-Wek tê zanîn, kadroyên fêrkirinê li ba hemî komisyonên li cîhanê ku bi zarokan ve girêdayî dikevin bin perwerdekirineke zanyarî û pîşeyî ta ku dibin perwerdevan û mamoste. Bi dîtina me, mamosteyên ku rêvebiriyê bi nav kirine, ne li ser bingeheke zanistî û zanyarî hatine perwerdekirin û ne jî di bin ezmûnên pêgerek re derbas bûne. Beşek ji wan, tenê di korseke ji heyvekê yan ji du heyvan re derbas bûn û stubariya fêrkirinê bi wan hatiye hilpesartin. Di dima ku bi sedan kadroyên fêrkirinê civaka kurdî hene.

4-Bikaranîna şêweya devkî ji fêrkirinê re di hin dibistanan de, ji ber nebûna rêbazên biryarkirî yên çapkirî ji destpêka sala fêrkirinê de û hin pêgerekiyên din, herweha hinek pirsgirêkên rêvebirî û yasayî ji bo dandina belgeyan û veguhestina ji deverekê ta yeke din jî têne dîtin.

Em ji aliyê xwe ve doza seknandina fêrkirinê an jiholêrakirina metiryalên kurdî ku hene, nakin, her weha em napejrînin jî ku rêbazên hene hinek bikin sedema koçberiyê yan perçebûnê yan jî zêdegaviyên siyasî û partîtiyê. Di nêrîna me de, erêniyên hene ew in, ku fêrkirin di vê zehmetkêşiyê de ranewestiye, aliyek heye rêvebiriya wê dike, û cara yekê ye ku di dibistanan de bi zimanê kurdî tê fêrkirin, û metiryalên ku hene jî ne ji yên rijîmê xerabtir in, ger em nebêjin jê baştirin, lê em doza jinûvedurustkirinê û pêşxistina vê stubariya giring dikin, ew jî gerek e di riya sûdewergirtina herî bilind ji kanîn û pisporeyên ku di civaka me de henewere kirin, û derxistina vê pirojeya pîroz ji hembêza partiyekê û aliyekî siyasî û rizgarkirina rêbazan ji guvêşoka teng a bîrdoziyê.

***Wegerandin ji Rojnama ElWehdê – hejmar 267:*** **Memê Alalan**.

**Azadî ji girtiyên siyasî û xebatkarên gelê me yê Kurd re, yên di girtîgehên Sûriyê de**

**Êmêla Newrozê:**
**Newroz@yek-dem.com**